

# EVDIREHÎM REHMÎ HEKARÎ Û BERHEMA WÎ YA LI SER TARÎXA KURDAN: *PEREK ZÊRÎN JI TARÎXÊ\*\**

---

Kurte-Evdirrehîm Rehmî Hekarî (1890-1958) yek ji şair û rewşenbîrên Kurd e ku di dewrê dûmahîkê yê Osmanî de jiyaye. Wî hem ew dewr dîtiye hem jî di dewrê Komara Tirkîyê de ketiye nav xebatên siyasî û edebî. Digel endamtiya komel û civakên Kurdistan yên wê demê ên li Stenbolê, Evdirrehîm Rehmî heta dûmahîka emrê xwe li ser meseleyên millî, civakî û dînî gelek berhem nivîsîne û weşandine. Yek ji wan berheman jî *Gaziya Welat* e ku ew ji çar cildan pêk dihêt.

Di vê nivîsê de em dê li ser beşek ji wê berhema Evdirrehîm Rehmî Hekarî ya bi navê “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” rawestin. Digel wê ji aliyê rewşa Kurdistan ve muqayesekirina dewrê Osmaniyan û dewrê Komarê, em dê tehlîla dîroknivîsariya Evdirrehîm Rehmî Hekarî jî bikin.

\* Ayhan Geverî: Lêkolîner: Zanîngeha Mûş Alparslanê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî; PhD: Zanîngeha Bilkentê, Beşa Edebiyata Tirkî.

\*\* Ev nivîse cara ewil di sala 2013yê li Hewlêrê li Zanîngeha Selaheddînê di sempozyuma bi navê “*The 1st International Academic Conference on Kurds and Kurdistan in History-Kurds and Kurdistan in Ottoman Period*” de bi sernavê “Di Dewrê Dûmahîkê yê Osmanî de Şairekî Kurd û Berhema Wî ya Li Ser Tarîxa Kurdistan: Evdirrehîm Rehmî Hekarî û “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” wek gotar hatiye pêşkêşkirin. Me ev gotar digel serrastkirinê kurt kir û em cara ewil wê di kovara *Wêje û Rexneyê* de diweşînin. Lê piştî ku me ev gotar ji bo *Wêje û Rexneyê* şandî, ji nav weşanên

## Destpêk:

Sedsala dûmahîkê ya Dewleta Osmaniyan û hilweşîna wê împaratoriye û di encama wê de jî damezirandina komara nû ya Tirkîyê ne tenê di jîyana Tirkan de kartêkirin kiriye. Çawa ku jîyana Tirkan ya rojane û komalayetî piştî Îlana Tanzîmatê û avakirina komara taze, ji nû ve hatiye tenzîmkirin, ew dewrê tarîxê herwisa di jîyana Kurdan de jî bûye sebebê gelek guherînên bingehîn û kûr.

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn nexşeya rojhilata naverast jinûve dihate destnîşankirin. Lê di vî dewrê girîng de rewşa Kurdan ya civakî û siyasî ber bi xirabiyê ve û jîyana rojane/Kurdewar jî ber bi bêdengiyekê ve diçû. Lewra ji dewrê dûmahîkê ku li paytextê Împaratoriya Osmaniyan desthilatî ketiye destê Îttihad-Terakkîciyan heta demên nêzik, halê Kurdan li Kurdistan û Tirkîyê di nava lepên înkâr û îmha û piştaftinê de boriye.

Di vî dewrê muhîm ku li ser tarîxa Kurdan û pêşeroja Rojhilata naverast gelek guherînên mezin çêbûne de wekî rewşenbîr û zana û edîbên li paytextê Osmaniyan li ser halê civakî-siyasî hêbetek guftugo û gengeşî kirine. Herwesa di avakirina Cumhuriyetê û salên paşî de jî ew munaqeseyên siyasî wekî yên berê xurt nebin jî bi şiklekî penive dihatine kirin.

Rewşenbîrên ku dilê wan ligel dewama îdareya Osmanî bûn û daxwaza pergala kevin dikirin, di eleyhê Cumhuriyetê de diaxftin û yên ku terefdarên komara nû bûn jî li hember her tiştê kevin rabibûn û mu-dafaya sîstema nû dikirin. Wêca di vî halê civakî-siyasî de rewşenbîrên Kurdan jî di nava xwe de gengeşî kirine û ji bo çareserîya milletê Kurd reçete û çarenûs pêşkêş kirine.

Avestayê bi navê “Zana û Rewşenbîr Evdirehîm Rehmî Hekkarî” kitêbek derket û nivîskarê wê Necat Zivîngî di wê kitêbê de ev beytên di vê gotarê de ne bêdestûr wergirtine û kitêba xwe li ser van beytan ava kiriye. Herçiqas ji bo weşandina wan beytan di navbera me de çî diyalog çênebîbin û me destûr nedabe jî, nivîskarê kitêbê -ku wî beşa huquqê xilas kiriye û ew awukat e jî- wek ku me destûr dabê diyalogên/çîrokên mîzansen îcad kirine. Divê bête zanîn ku diyalogên wisa çênebûne û karê hatiye kirî jî -herçiqas referans hatibe dayîn jî- li gor me “dizî” û “întîhal” e. Ji aliyê dî ve jî weşanxaneyek wek Avestayê ku di van rojan de bîstaliya xwe pîroz diket, bêyî pirsîn û xwestina destûrê ew kitêb çap kiriye û bûye dezgehê vê “na-heqqiyê”... Û herçiqas xwediyê weşanxaneyê birêz Abdullah Keskin pêşiyê “nivîskarî ez jî xapandime, ji bo helkirina vê meselê çî ji destê me bê emê bikin, em ji mesûliyetê narevin” gotibe û niv-lêborînek xwestibe jî ev meseleya întîhalê li meydanê ye û me xwest em vê yekê wisa qeydkirî bihêlin da ku xwendekar haydar bibît. Herwisa di xebata me ya li ser Zapsu de ev mesele dê berfirehtir bihête vegotin...

Di nav wan rewşenbîran jî yek Evdirrehîm Rehmî Hekarî (1890-1958) ye ku hem di dewrê dûmahîkê yê Împaratoriya Osmaniyan de jiyaye hem jî di destpêka Cumhuriyeta nû û dewrê “Şefê Duyemîn” Îs-met Paşa de jiyaye û halê Kurdan di nivîs û berhemên xwe de gelek baş teswîr kiriye.

Ji aliyê dî ve wekî ku em dê di vê nivîsê de jî bibînin digel gelek taybetiyên xwe ve Evdirrehîm Rehmî Hekarî, bi tarîxnivîsiya xwe ve jî navê xwe li van dewrên tarîxê -yên ku jê hatiye behskirin- nivîsiye. Di vê çarçoveyê de berhema wî “Perek Zêrîn ji Tarîxê” hem ji aliyê naverokê ve hem jî ji aliyê nivîsîn û teswîra dewrên tarîxî gelek girîng û hêja ye.

### **I. Kurtejiyana Evdirrehîm Rehmî Hekarî**

Evdirrehîm Rehmî Hekarî yan jî bi navê dî, yê ku piranî di nivîsên xwe yên Tirkî de bikartîna, Abdurrahim Rahmi Zapsu, di sala (1309ê Hicrî) 1890ê Mîladî, li Elbakê/Başkaleyê hatiye dinyayê. Navê babê Evdirrehîm Rehmî Hekarî, Seyîd Mehemed Pertew e, navê dayîka wî jî Emetullah Xanim e ku ew jî kiça Hecî Teyar Begê ye. Li gor hemû çavka-niyên li ser Evdirrehîm Rehmî Hekarî hatîne nivîsîn, tête gotin ku ew jî aliyê nesebê babî ve digehine Şêx Evdîlqadir Geylanî û ji aliyê dî ve tête gotin ku Zelîxa Xanima dayîka Emetullah Xanimê, yanî dapîra Zapsu, jî kiça Seyîd Mihyeddîn Arvasî ye (Pertev Zapsu 2006: 11; Kılıç 15).

Rehmî Hekarî tehsîla xwe ya pêşîyê li Elbakê, ya navîn jî li Wanê li mekteba “Darulmu’elîm”ê temam kiriye. Piştî wê, li Enqerê “Mek-teba Meslekî ya Maliyeyê” xwendiyê û herwisa di Zanîngeha Stenbolê de jî beşa îlahiyatê xilas kiriye. Evdirrehîm Rehmî, jîbilî perwerdeya ji mektebên resmî, di medreseyan Kurdistanê de jî xwendiyê û îcazeta xwe wergirtiye. Di pêşîya kitaba wî *Büyük İslâm Tarihi*’yê de kurê wî Mistefa Pertew dibêjit ku babê wî îcazetnameya xwe ji destê Seyîd Taha Arvasî standiyê. Li gor Mistefa Pertew Zapsu, ew îcazetname Nezareta Mearifê yanî Wezareta Perwerdeyê jî tesdîq kiriye (Pertev Zapsu 11).

Dema Şerê Cîhanê yê yêkem qewimî, li Kurdistanê li hember Êrisan (Rûsan) artêşên milîsên fedaî damezirandiye û ew bixwe jî di wî şerî de li seffên pêşîyê şer kiriye. Piştî wî şerî ew birîndar dibit û ligel Bedûûz-zeman Seîdê Kurdî dikevîte destê Êrisan. Piştî ku Êrisan ew êsîr kirine, wî dibine Girava Nargînê ya di nava Behra Hezerê de û li wêderê di kampa êsîran de tête hebskirin (Pertev Zapsu 11-2).

Rehmî Hekarî, li kampa êsîran ya li Girava Narginê dest bi xebatên dîni û millî kirine ku li wêderê di wê rewşê de zarokên êsîr yên Muslu-

man perwerde kirine, heta 22yê Çirîya Pêşîn 1333yê (1917) nêzîkê salnîvan dersên millî û dînî dane wan zarokên êsîr. Jixwe herwisa li wê dewrê berhemên xwe yên ji bo zarokên êsîr nivîsîne.

Rehmî Hekarî, piştî hingî ji wê kampa eskerî direvît û piştî rêwîngiyeke dûr û dirêj digehîte Bakûyê. Li wêderê bi harîkariya mirovên derûdora xwe, wan helbest û berhemên xwe yên li kampê nivîsîbûn bi navê *Garîp Çocuklara Ahlâk Aşısı* çap diketin. Her dîsa Zapsu li Bakûyê berhema xwe şanoya menzûm *Bir Esir Çocuğun Hatırası* bi wesîleya Muslumanên Bakûyê diweşînit (Pertev Zapsu 12).

Kurê Zapsu, Mistefa Pertew Beg di pêşgotina kitaba babê xwe *İslâm Tarihiyê* de derheqê jîyana babê xwe van me'lûmatan didetin:

[Evdîrrehîm Rehmî] ji umrê xwe panzeh sal bi mamostetîyê û panzeh sal jî wekî maliyevanekî derbas kir. Piştî hingî jî heft salên xwe bi xebatek daîmî li ser kovara xwe Ehli Sunnet Mecmuasıyê borandin û berhemên xwe yên di nivîsîn. Ehli Sunnet Mecmuasıya ku Evdirrehîm Zapsu derdixist, wî wextî berevaniya nirxên millî û me'newî yên civakî dikir û wî bi xwe jî mucadeleyek wisa dikir ku rewşek wisa pêkbêtin û herkes bişet fikr û ramanê xwe bi serbestî îfade biketin. Ev kovara ku wî wextî têda gelek nivîsên nivîskar û rewşenbîrên dema xwe cihgirtî, bi destê hukumeta hingî gelek caran hatiye girtin û gelek hejmarên wê hatine berhevkirin. Nivîskarê ku di sala 1951ê de ji bo Kongreya Îslamê ya Cîhanî hatiye vexwendî, hingî bi mebesta azadkirin û serxwebûna neteweyên Musluman û ji bo dana mafên wan yên insanî, di nava gelek tevger û xebatan de bûye. 9ê Sibata 1958ê li Stenbolê wafat kiriye û qebrê wî li hember Şehîdiya Edirnekapiyê di Qebristanê Necatî Beg de ye. (11)

Zapsu jîbilî Kurdî û Tirkî, Erebi, Farisî baş dizanî û di salên esaretê Êrîsan de jî Almanî û Rûsî fêrbûye.

## II. Berhemên Evdirrehîm Rehmî Hekarî

Evdîrrehîm Rehmî Hekarî nivîskerekî welûd bû û bi Kurdî û Tirkî gelek berhem nivîsîne. Bi giştî du mijarên berhemên Hekarî hene ku yek ji wan neteweperwerî û kurdewarî, ya duyê jî dînperwerî ye. Evdirrehîm Hekarî bi dehan berhem nivîsîne û ji wan gelek yan bi destê wî hatine çapkirin yan jî piştî mirina wî ji destê malbata wî hatine belavkirin.

Evdîrrehîm Rehmî Hekarî di nivîs û pirtûkên xwe yên Tirkî de para pitir li ser mijara dîndariyê rawestiyaye. Ji aliyê dî ve berhemên Kurdî

jî zêdetir derheq milletperweriya Kurdan û li ser vê bingehê derbareyê meseleyên dînî hatîne nivîsîn. Di nav berhemên Tirkî de *Büyük İslam Tarihi* û kovara ku wî derdixist *Ehli Sünnet* gelek deng vedane û di nava berhemên wî yên Kurdî de jî rêzokitêbên *Gaziya Welat*, piyesa *Memê Alan* û çend şîirên prakende zêdetir hatine nasîn û xwendin.

Heta niha kulliyata berhemên wî bi rêkûpêk nehetabû tesbît û tesnîfkirin. Lê îro em bi giştî dizanin ka wî çiqas kitêb û çiqas nivîs û helbest nivîsîne. Herçend gelek ji berhemên wî hêj negeheştibine ber destê me jî, em ji yên din kunye, nav û nîşanên wan dizanin. Bo nimûne, di dawîya berhema wî, ya ku me vê dîmakî bi destxistî, *Dersa Dîn* de em dibînin wî navên gelek eserên xwe daye ku ew di wî wextî çap bûne yan jî dê çap bibin. Tiştê balkêş ew e ku di vê lîsteyê de Evdirrehîm Rehmî Hekarî mufredata Kurdî amade kiriye ku ew mufredat ji danzêdeh pirtûkan pêk dihêt. Ji wan kitêban jî yek *Nûbihara Piçûkana Ehmedê Xanî* ye û yên din hemî yên Evdirrehîm Rehmî ne. Di nav berhemên Rehmî Hekarî de ji luxet û elfabeyê heta qira'etê û ji coxrafayê heta matematîk û ilmên dînî mijarên cuda cuda hene.<sup>1</sup>

Evdirrehîm Rehmî Hekarî jibilî karê nivîsîn û ilmê, herwisa di nava sazî û komeleyên Kurdan ên wê demê de jî wekî şexsekî çalak û zîrek cih girtiye. Di avakirina Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyetiyê (Komela Pêşketina Kurdistanê) û Hêvî-Kürt Talebe Cemiyeti (Cem'iyetî Talebey Hêvîy Kurd)ê de endam bûye (Malmîsanij 72; Bozarlan 27; Kılıç 36).

Evdirrehîm Rehmî Zapsu di gelek kovarên Tirkî û Kurdî yên demê Osmanî de nivîsiye. Ji wan jî *Jîn* muhîmtir kovar e ku Evdirrehîm Rehmî têde wekî şair û rewşenbîrekî Kurd û welatperwer hêbetek berhem nivîsîne û weşandine. Heta di nava nivîskarên *Jînê* de zêdetir berhemên Kurdî, Rehmî Hekarî nivîsîne û gelek numûneyên cureyên nivîsê cara ewil di wê kovarê de belav kirine:

Evdirrehîm Rehmîyê Hekarî jî yek ji hozan û nivîskarên kovarê yên timî bûye. Pirrê nivîsar û helbestên wî bi Kurdî ne û evîna Kurd û Kurdistanê ji wan difûre. Her weha, piyesa wî ya Kurdî "Memê Alan" jî di "Jîn"ê da derketiye. Wisa tê zanîn ku ev, piyesa Kurdî ya pêşîn e. (Bozarlan 12)

Wekî li jorî jî hate behskirin, digel berhemên Rehmî Hekarî yên hatîne weşandin û tene zanîn, gelek berhemên wî yên nehatine weşan-

1 Binêre: Evdirrehîm Rehmî. (1921). *Dersa Dîn*. İstanbul: Necmî İstiklal.

din jî hene. Ji wan jî yek *Gaziya Welat-4* e ev berhem ji rêza kitêba *Gaziya Welat* ya çarê ye. Ji vê rêzê “Kitêba Ewel” *Gaziya Welat-1* di sala 1919ê de li Stenbolê hatiye çapkirin ku ew helbestên di vê kitêbê de di kovara *Jînê* de jî hatine belavkirin. “Kitêba duyê” *Gaziya Welat-2* jî dîsa li Stenbolê di sala 1921ê hatiye weşandin û di wê kitêbê de jî deh helbestên Kurdî hene ku ew jibilî vê kitêbê di ciheke din de nehatine weşandin. Lê kitêba sêyê -yanî “*Gaziya Welat*”a sêyê- winda ye û heta niha nehatiye dîtin.

Bingeha mijara vê nivîsê “*Perek Zêrîn ji Tarîxê*” jî menzûmeya Rehmî Hekarî ye ya li ser tarîxa Kurdan ku ew menzûme di nava *Gaziya Welat-4*ê de wek helbesta ewil cih digirît. Rehmî Hekarî di vê menzûmeyê de tarîxek çawa nivîsiye, tarîxa Kurdan li ser çî babetan ava kiriye hwd. em dê li dor bersiva van pirsan tarîxnivîskariya nivîskarî bibînin.

### III. Tarîxnivîsînek Nûjen: *Perek Zêrîn Ji Tarîxê*

Evdirrehîm Rehmî Hekarî, di nivîsîna tarîxê de ji usûlên beriya xwe yên dewrê Osmanî îstifade kiriye. Di nivîsîna tarîxên malbatên mezin û begtî û xanedanan de usûl û rêbaz çawa hatiye, wî jî li ser wê metodê bingeha tarîxa xwe ava kiriye. Ji aliyê dî ve Rehmî Hekarî jibilî usûla naverokê û vegotinê herwisa di terzê nivîsînê de jî wekî nivîskar û muellifên beriya xwe kiriye. Lewra wî ew tarîx bi şiklê nezmê/helbestê nivîsiye û berhema wî wek awa jî awayê mesnewiyê ye. Yanî wî jî wekî tarîxnivîsîn berê, berhema xwe bi şiklê mesnewiyê nivîsiye. Ew jî di aliyê dewamkirina nivîsîna adetî gelek balkêş e ku Rehmî Hekarî bi vê yekê çawa ku xwe ji aliyê vehonandina naverokê ve sipartiye yên pêşîn, herwisa ji aliyê uslûba şiklê nivîsînê ve jî piştî xwe daye muellifên wekî Firdewsî. Lewra çawa ku wekî adetê nivîsîna tarîxa mîr û began ên wekî *Şehnameya Firdewsî*, bi şiklê mesnewiyê dihate nivîsîn, Evdirrehîm Rehmî Hekarî jî li ser wê adetê nivîsîna tarîxê berdewam kiriye. Ew jî -naveroka gotinên Rehmî Hekarî li aliyekî- rêbaza tarîxnivîsîna wî qîmettir diket.

Evdirrehîm Rehmî Hekarî, “*Perek Zêrîn ji Tarîxê*” li ser tarîxa Kurdan nivîsiye û ew tarîx ji Hezretî Nûh heta salên 1920an înayê û behsa bûyer û lehengên dema xwe kiriye, rewşa Kurdan ya serê sedsala borî îlawe kiriye.

Rehmî Hekarî çawa ku di sala 1919ê de cara ewil şanoya Kurdî nivîsiye herwisa bi nivîsîna “*Perek Zêrîn ji Tarîxê*” jî, hindî ku em pê dizanin, bûye şairê ewil yê ku tarîxa Kurdan bi awayê helbestê/mesnewiyê

nivîsîy... Ev tarîxa Rehmî Hekarî ji gelek aliyan ve balkêş e û taybetiyên wê yên cuda hene. Wekî me gotî bi vî terzî di Kurdî de yegane numûne ye, ji demên berê -ji Hezretî Nûh- heta dema dawî ya desthilatdariya Osmanî hatiye hwd...

Pêşiyê divê mirov li ser wê taybetiya vê berhemê raweste ku çima muellifê wê, tarîxa Kurdan ji Hezretî Nûh daye destpêkirin? Helbet wekî têtê zanîn sebebê wê yekê “Tufana Nûhî” ye ku insan ji nû ve li dinyayê belav bûne. Lê li gor Rehmî Hekarî ew bûyer herçend di tarîxa insaniyetê de tiştê girîng bit jî, ji bo Kurdan taybetiyên cuda hene. Lewra li gor wî hem Hezretî Nûh Kurd e hem jî keştiya wî li ser çiyayê Cûdîyê veniştaye.

Rehmî Hekarî, bi nivîsîna tarîxa Kurdan ya ku ji Hezretî Nûh destpê diket hem xwe dispêrîte referansên qedîmî hem jî vî tarîxê bi destpêkek îlahî/dînî ve girêdidet. Lewra Hezretî Nûh hem pêxember e hem jî babê temamê insaniyetê ye. Bi vî şiklî ve jî Kurdbûna Hezretî Nûhî jî mirovan dibete wê encamê ku Kurd bab û ebayên temamê insaniyetê ne. Helbet ev fikr, iddiayek zanistî nebit jî Rehmî Hekarî li gor xwe çend isbat dane. Ew jî veniştina gemiya Nûhî bi Cûdîyê ye ku li gor şairî etîmolojiya kelimeya “Cûdî” Kurdî ye û ew ji “Cî dî” û yan jî ji “Çû dî” murekkeb e:

Ji nesla Hezretî Nuh im ku navê wî Melîk Kurd e<sup>2</sup>  
Ji wî ev nav mabû milletê min, lew dibên Kurd e

Esasê dînê Tewhîdê ji bo me xelq kirî Ellah  
Ji me rabûn temamê enbiyan hem Resulellah

Di tarîxa muqeddes da muheqeq rabûye Tufan  
Nesara û Yehud û Musluman pêkve dîkin îman

Sefîna Hezretî Nuhî ku westaye li ser Cudî  
Bi nesa ayetê ev sabit e Cîdî we ya Çudî

---

2 Ev beytên em ji “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” didin di nava pirtûka ku me amade kiriyê de cih digirin. Ji ber ku ew berhem hêj nehatiye çapkirin û ew esera Rehmî Hekarî jî heta niha nehatiye belavkirin, çavkaniya/referansa van beytan nehatiye dan. Ew dê bi temamî di nava pirtûka me ya bi navê “Jîyan û Berhemên Evdirrehîm Rehmî Hekarî” de heta demeke nêzik bêne belavkirin.

Helbet gava Rehmî Hekarî van fikrên xwe dibêjît û îddiyên xwe pêşkêş diket, xwe dispêrîte çavkaniyên qedîm; çawa di *Qur'anê* (sureya Hûd ayeta 44ê) de hatiye, navê çiyayê Cûdî aşkera û yekser derbas dibit. Lê di meseleya istiwaya keştiya Nûhî ya bo çiyayê Cûdî de Rehmî Hekarî pê agahdar e ku ka di tefsîrên *Qur'anê* de çi hatiye nivîsîn. Lewra ew piştî van beytên jorî yên destpêka tarîxa xwe behsa navê gundê “Heştan” diket ku ew jî di gelek çavkaniyan de derbas dibit û îşareta wan 80 kesan diket ku li gor qinaeta mufessiran di keştiya Nûhî de ewqas kes hebûne (Bulaç 226). Lê Rehmî Hekarî, rasterast reqemê heştê nadet û behsa gundê “Çîmal”ê diket, ku di tefsîran de şûna vî navî navê gundê “Heştan”ê heye:

Çiyayê Cudî yê halen di nîva Cezreya Bohtan  
Di etrafê çiya kes nîne eqwaman jibil Kurdan

Di binya Cudîyî gundek heye navê wî Çîmal e  
Ewê naci di gemyê da digel Nuhî jî çil mal e

Ev îddiyên Rehmî Hekarî çiqas zanistî yan jî ilmî ne, mirov dikarît li ser wan gengeşiyên biket. Lê tişteke din heye ku Rehmî Hekarî ew îddiya ku Kurdan digehînite Hezretî Nûhî ji ber xwe negotiye û mînakên wê yên muhîm li ser tarîxên milletên di jî hene... Rehmî Hekarî, Kurdperwerekî dîndar bû û herwisa babetên dînî jî baş dizanî û pisporê wan meseleyan bû. Wêca ji bo yekî wekî Rehmî Hekarî, xwegehandina Hezretî Nûhî ne tişteki xerîb e, lewra li gor *Qur'anê* temamê insan digehine wî. Ev xala dîndariya şairî ye. Lê ji aliyê di ve jî gava em li tarîxa begîtiya Osmaniyan dinêrin, di çavkaniyan de tarîxnivîsên wê malbatê koka wan heta kurên Hezretî Nûhî dibin. Ji wan yek muellifan jî Şerefhanê Bidlîsî ye ku di cildê duyê yê *Şerefnameya* xwe de gava behsa şeceraya Osmaniyan diket wan digehînite Yafesê kurê Nûhî (Şerefhan Bitlisi: 20). Jibilî Şerefhanî çavkaniyên Farisî û Osmanî jî li ser vê babetê eynî tiştan dibêjin. Mîsalen tarîxnivîsên li ser xanedaniya Osmaniyan nivîsîne yên wekî Aşîk Paşazâde di *Tevârîh-i Âl-i Osmânê* de (321), Mevlânâ Mehmed Neşrî jî di *Cihânnümâyê* de (30) gava behsa vê malbatê dikan, şeceraya wan dîsa heta Yafesê kurê Nûhî dibin. Yanî di vê meselê de bi aşkerayî tete dîtî ku haya Evdirrehîm Rehmî ji wan berhemên adetî hebû û wî jî xwastiye tarîxa Kurdan li ser wê usûl û adetê heyî binivîsît.



Taybetiyeke dî ya “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” ew e ku Rehmî Hekarî dest-pêka wê li ser referansên dînî avakiriye: Hezretî Nûh wekî Melikê Kurd daye nasîn û welatê Kurdan Kurdistan jî wekî navenda tewhîdê/dînên îlahî bi nav kiriye. Ew jî ji bo ku muellif gotinên xwe bi xwendevanan re bidete qebûlkirin, teferruatên muhîm in. Ji ber wê jî Rehmî Hekarî jibîlî Hezretî Nûhî, behsa pêxemberên dî jî diket û wan jî bi axa Kurdistanê ve girêdidet û dibêjit herçend piştî Tufanê millet li dinyayê belav bibin û ji dîne eslî dûr ketibin jî Kurd hê jî li ser dîne resen û heq in:

Esasê merkezê Tewhîdê qudsê erzê Kurdistan  
Newala agirê Nemrûd Xudê lew kire biharistan

Ji eqlê Kurdî dûr e ew şerîkan bo Xwedê çêket  
Weya bêjit Xudê ye ew ji bo xwe pûtekê çêket

...

Bi eqlê Kurdî li ‘Izzê Îbrahîm Xelîlullah  
Go Azer yek kevir anî tiraşî gote wî “ellah”

Nekir esla qebûl, ew bêşu‘ûrî dît Îbrahîm  
Di mulkê Kurd û Kurmancan da nabît dînekî bêxîm

...

Muhaqeq Kurd e Îbrahîm di Ruhay hatiye dunya  
Nivîsî Azer’el-Kurdî tamam tarîx bibîn waya

...

Binêre mulkê Kurdistan heye ma yek senem yek pût  
Şîrîk wan çênekir bo Heq, di behra wehdetê mebhût

Rehmî Hekarî, piştî ku Hezretî Nûhî wekî “Melikê Kurd” didete nasîn û ji bo Hezretî Îbrahîmî jî dibêjit “muheqqeq Kurd e”, dest bi tesbîta ne-sebê Hz. Mûsa û Hz. Îsa diket û dawîya dawî jî hemû ‘Ereban dikete Kurd û eşîra Hz. Muhemmed Qureyşîyan jî wekî eşîreka Kurd didete nîşan:

Eva Musa eva Îsa hemî nesla Xelîlullah  
Kurê dî bûye bapîrê Muhemmed heq Resulellah

...

Qureyšî Kurd û Kurmanc in muheqqeq xwûnekî pak in  
Eger çî bîr kirin ezmanê eslî lê bi îdrak in

Di weqtê cahîliyet da li ser dînê Henîfî bûn  
Eger çî hin ji wana tabî'ê 'Erebîyê dî bûn

Veke tarîxê Îslamê fezîlet 'ilm û însanî  
'Edalet merhemet heq û heqîqet gi ewan danî

Rehmî Hekarî bi vê helwestê xwastiye ku hem ji aliyê dînperweriyê hem jî ji aliyê nesebekî pak û pakîze ve Kurdan bidete nasîn û tarîxa wan *ji nûve* wisa binivîsît. Di vê çarçoveyê de herwekî ku John Tosh di berhema xwe ya bi navê “*Li Dûv Tarîxê*” (*The Pursuit of History*) de dibêjit ku tarîxnivîsîn bi sê awayên teknîkî ve mumkin dibit. Ew sê awa jî teswîr, vegotin û tehlîl in. Herwisa li gor John Tosh di bingeha tarîxnivîsînê de gengeşiyek muhîm heye ku ew jî bi du şiklan diyar dibit: yan bi şiklê *jinûve-afîrandina* demên borî yan jî *şîrovekirin* (Tosh 106). Vêca Rehmî Hekarî, ji heta niha ku me çend beyt ji berhema wî “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” xwendî, bi nivîsîna vê tarîxê ve dîrokeke nû çêdîket û wê *jinûve diafirînit* yan jî tiştên ku heyî *şîrove diket?* Beriya her tiştî di-vêtin jibîr nekin ku di destê me de berhemên bi vî şiklî nînin ku hem bi Kurdî hatibine nivîsîn hem jî wisa bi eşkera tarîxa Kurdan evqas dûr û dirêj bibet û bigehînite Hezretî Nûhî. Ji ber hindê jî ev berhema Rehmî Hekarî (hindî ku em dizanîn) yekem berhema Kurdî ye ku pêxemberên navborî dikete Kurd. Lê ji aliyê dî ve Rehmî Hekarî digel ku alimek têgeheştî bû, wî hem ilmên modern baş dizanî hem jî ilmên klasîk ên di medreseyan Kurda de dihatine xwendin dizanîn. Vêca di pêvajoya perwerdeya Rehmî Hekarî de çiqas kitêb hebûne ku wî xwendine û ew vê tarîxnivîsîna xwe dispêrîte wan?<sup>3</sup> Em wê nizanin, lê ew îddiayên ku hatine gotin wekî çavkaniyên tarîxa devkî (oral history) di nava Kurdan de her dem dihêne gotin. Lê bingeh û rastiya van gotinan çî ye hwd. mirov nizane û isbata wan jî bi usûlên akademîk û zanistî ne mumkun e... Jixwe her çawa be jî li vir ya muhîm rastiya gotinan zêdetir, usûla tarîxnivîsîna Rehmî Hekarî ye. Ger bi vî çavî li “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” bihê-

3 Di nava “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” de tenê behsa kitêbeka tarîxê ya alimekî Kurd, Ibnî Hacib (1174-5/1248?) dihête kirin: “Tarîxa Kamil”. Lê Rehmî Hekarî negotiye ka ew çî kitêb e...

te nêrîn, bi rehetî mirov dikarît bêjît ku Rehmî Hekarî ji şîrovekirinê zêdetir nêzîkê tarîxnivîsendeyek *jinûve-afirende* ye. Lewra hem dewrê ku wî têde halê Kurdan dîtî, hem jî misyon, têkilî û tecrûbeyên wî yên ilmî û entelektuelî mecbûr kiriye ku ew berhemek wisa binivîsît hetta *biafirinît*. Jixwe ji ber ku kesekê beriya wî tiştek wisa nenivîsiye ew bêyî gotinên xwe, tenê bi nivîsîna vê berhema xwe ve dibîte nivîskarê tarîxa *jinûve*. Lê divêt vê jî bibêjin, Rehmî Hekarî heta lêre di tarîxa Kurdan de behsa bûyer yan jî şexsek xirab û negatîf nekiriye. Ew jî taybetiyek vê tarîxa wî ye ku ew bi yeklayane hatiye nivîsîn. Ji aliyê dî ve jî sebebê navdayîna wî ya bo vê berheme jî em vê niyeta wî dibînin. Lewra ji ber ku navê wê “Perek Zêrîn ji Tarîxê” ye divê di perek wisan de gotinên menfî derheq vê tarîxê nehêne gotin...<sup>4</sup>

Rehmî Hekarî piştî ku bi vê bingehê dest bi tarîxa Kurdan kirî hêdî hêdî ber bi lehengên naskirî û yên girîng têtin. Lê ew wê navbera ku piştî Moxulî hatin û Kurdistan û herêma Rojhilata Naverast dagirkirî jî îşaret diket. Hember wê bûyera nexweş/negatîf dîsa ji perê zêrîn yê ji tarîxa Kurdan vediket û li hember pêlên kufrê behsa berxwedana Kurdan ya bo ala Îslamê û behsa Selaheddîne Eyyûbî diket:

Ji Şerqê Turkekî xwûnaxar hat navê wî Hulakû  
Şemala Wehdetê pivkir filleh rabûn bi zora kû

“Betal kin dîne heq xelqî bikin mûşrîk” kirin îlan  
Temamê Avrûpa rabû hedef Qur‘an hedef îman

Ji Kurmancan Selaheddîne Eyyûbî e‘lem rakir  
Şehamet daye meydanê rûhê eslafi pê şa kir

Di destek da ‘edalet ‘ilm û hîkmet fezl û emnîyet  
Di destê dî şehamet şîrê qudret xîret û hîmnet

Hizar caran hizar xelqê filleh hatin û bûn mexlûb  
Ewî nîşa me da me‘neyê dîne heq ew e metlûb

Ne ku tarîxê Îslamê di tarîxê filan da hem  
Bi zêrî hate neqîşîn navê serdarê ‘ezîz Ekrem

4 Herçend şexsiyetên negatîf ên wek Ziya Gökalp û Süleyman Nazif hebin jî, ew wan jî vê tarîxê nahesibînit!

Çirayê dîne Îslamê ji nû hilkir şemal geşbû  
Bi nûra 'ilm û îrfanê rûhê eslaf pê xweşbû

Piştî wan gotinan Rehmî Hekarî vê carê jî dest bi behsa lehengên Kurd ên di warê ilm û zanîn û edebiyatê de ne diket. Tiştê balkêş ev e ku Rehmî Hekarî pêşiyê bi behsa Îbnî Hacîb dest bi gotina wan aliman diket. Li gor ku Rehmî Hekarî dibêjît Îbnî Hacîb xwedan “tarîxekî kamil” e. Piştî wî behsa Îbnu'l-Esîr, Mela Camî, Herîrî diket û dibêjît “ew cumle Kurmanc in.” Paşî jî Xezalî, Îbnî Sîna, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Şêx Evdîlqadirê Geylanî dihejmêrît û dibêjît “hemî Kurd in bi wan fexrê bikin ey me'şera Ekrad / Eceb kî ehmeq e bêjîte me bêesl û bêbunyad.”

Evdîrrehîm Rehmî Hekarî heta lêre behsê diînîte ser Kurdên qedîm û wan di nava vî perê zêrîn de zikir diket. Piştî wê jî dest bi behsa fedakarî û wefaya Kurdan û têkiliya Tirk û Farisan ya bi Kurdan diketin. Di van rêzikên Rehmî Hekarî de Kurd, samîmî û mu'mîn in û fend û hîleyan nizanin lê di destê milletên dî de ketine bendan. Rehmî Hekarî derheq Kurdan di “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” de êdî dest bi gotinên neyînî jî diket ku li gor wî Kurd “ji bo xwe nerehm in lê ji bo xelqê fidakar in.”

Paşî jî meseleyê diînîte ser têkiliyên Tirk û ‘Ereban û dibêjît herçend ew birayên dînî bin jî di wextê firsetê de wan namînit însaf û dîn. Ew jî li dor meseleya daxwaza Kurdan e ku Rehmî Hekarî li hember Tirk û ‘Ereban wekî Kurdekî milletperwer radibît û behsa qetlîam û fermanên li ser milletê Kurd hatinekirin diket:

Wekî gur ketine nav berxan nema însaf nema wîcdan  
Jin û zaro kirin qurban ewan xwûnxar û bêîman

Wekî cûwan diçû xwûna feqîr û jar û me'sûman  
Kesê navê Xudê îna li qetla wî kirin ferman

Mela û şêx û beg kuştin ne namûs û ne 'îrz hiştin  
Pez û mal kirine talan navê malê wan bi xwûn şuştin

Zikê dayîkan qelaştin zaro derxist dane ber xencer  
Ewê ji wan ra sedaqet kir nefî kir têkîrin ber der

Ji birsyan hin mirin hin bûn qadîd esla nema wan hal  
Ne exlaq û ne namûs ma, ne mulk û xanî û navmal

Wekî ku me berê jî behsa tarîxnivîsîna Rehmî Hekarî kiribû û gotibû ew tarîxeke nû çêdiket û ji bo Kurdan wê *jinûve* dinivîsît. Lê ev hukm zêdetir li ser tarîxa Kurdan ya qedîm ve bû ku şairî tiştên nû digotin. Lewra em dibînin gava ew êdî tarîxê ber bi demên nêzik ve diînit û behsa wan rojên ku ew bi xwe jî sax bû diket, wekî tarîxnivîserekî cuda tevdigerît. Ji Hezretî Nûh heta ku ber bi dawiya sedsala 19ê têtin, Kurd li ser perek zêrîn têne nasîn. Ji gotinên şairî wisa xuya dibit ku qey Kurdan heta wî çaxî jîyanek xweş û geş borandine lê piştî hingî her tişt serrevajî bûye. Helbet di vir de êdî em Rehmî Hekarî wekî afirînerê tarîxê nabînin lê ew wekî tarîxnivîserekî şîroveker dinivîsît û bûyeran wesa neql diketin. Ew di wan ristên xwe yên dewam dikin de êdî ji perên tarîxê naxwûnit lê ji teswîra halê Kurdan yê hazir diketin. Li gor wî êdî qedrê mezinan nemaye û ilm û fezîlet bêqîmet bûye û civat roj bi roj ber bi xirabî û fesadê ve diçît. Yanî êdî Rehmî Hekarî di van gotinan de wekî tarîxnivîserekî ne, lê wekî teswîrgirekî neql diket û wisa dinivîsît. Lê gava di van beytan de ji aliyekî ve wekî rexnegîrekî civakî behsa bûyerên xirab diket, ji aliyê di ve jî behsa bêxîretî û tiraliya Kurdan û meyla wan ya bo cehaletê ve jî diket...

Şair di vir de ji xwe dipirsît ka bo çi rewşa Kurdan wisa xirabbû û paşî jî bersivê didet ku li gor wî baisê temamê wan şolên xirab, qetil-kirina Kurdan û belavbûna fesadê, îlankirina Tenzîmatê û Xettê Humayûnê ye:<sup>5</sup>

Gelo ev wehşet û zorî li kengî destî pê kiribûn  
Dema çavda fillan teqlîdê kufrê kirin û kafîrbûn

...

Dema îlan kir Xettê Humayûn got û Tanzîmat  
Temamê mîr û beg girtin nema esla me taşkîlat

...

5 Divê nehête jibîrkin ku Evdirrehîm Rehmî Hekarî, rewşenbîrekî dîndar û Îslamî ye. Ji ber hindê jî li hember alema Rojava û qanûnên wan yên nû radiwestîtin. Li gor wî halê berê yê Osmanîyan çêtir û meqbûltir e ji wî halê nû... Çawa ku alim û rewşenbîrên beriya wî yên wekî Namik Kemal û Şêx Riza Telebanî li hember Qanûnî Esasîya ku di sala 1876ê de hatiye îlankirin rabûne (binêre: Geverî 2012: 50), Rehmî Hekarî jî wekî ji wê silsileyê fikrî têtin, li hember reformên Rojavayî radibît û wan wekî bîngeha fitne û zulmê dibînit.

Fillan bêdînê Turkan kirne isyan û li hev civiyan  
Di nava Avrûpayê pur bi quwet bû civata wan

Ji textî [ê]xistin û xunkar kirin îlanê hurriyet  
Ji bo wan bûye azadî ji bo me bûye mehwîyet

Fille xwenda bûn em cahil hemî dişixolin em ‘atil  
Diçandin wan, em axa bûn tiral û aciz û batil

Rehmî Hekarî di van beytên dawiyê de rexneyên xwe ji rewşenbîrekî Kurd zêdetir wekî rewşenbîrekî Osmanî gotine. Lewra wî li hember “Îttihadçî”yan ev gotinên xwe gotine û hedefa tîrên wî jî ew in. Lê gava mirov dewam biket û “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” bixwûnit, bi aşkerayî dê bibînit ku Rehmî Hekarî ev hemû gotin zêdetir li dor perîşaniyên Kurdan vegotine. Lewra piştî van tesbîtan êdî ew behsa lehengên Kurd yên wê demê û zilma bi ser serê wan ve hatî diket. Li gor ku ew neql diketin Şêxê Hîzanî bi behane li Bidlîsê hate daliqandin û zulm li Suleymanê Bedirxanî hatiye kirin. Dîsa qala meseleya Mela Selîm û teslîmbûna wî bo Êrîsan û behsa kuştina wî diketin...

Diyar e ku Rehmî Hekarî bûyerên siyasî û civakî yên serê sedsala borî wekî destnîşankirina qedera Kurdan dibînit û li ser wî çaxî gelek radiwestît. Digel wê jî di nava aktorên wî demî de yên Kurd, hem deşîfre diketin hem jî navên wan diguherînit û xirab diketin. Mesela Suleyman Nazîfê Diyarbekirî ku di sala 1914ê de Şêx Evdisselam Barzanî îdam kirî wekî Suleyman Kenîf, Dr. Evdila Cewdetî wekî Adu Cewdet (yanî Dijmin Cewdet) bi nav diket û digel wan Ziya Gokalpî jî zikir diket û ji bo wan hersê kesan wisa dibêjit: “Hinek bedeslî derkevîtin ji qewmê me se û bêbab.”

Di dewama “Perek Zêrîn ji Tarîxê” de panoramaya Kurdên wî çaxî bi çavê rewşenbîr û zanayekî Kurd dihête neqlkirin ku Rehmî Hekarî piştî van gotinên li ser Îttihad-Terakkîciyan behsa serboriya navdarên Kurd ên wê demê diket. Ji wan navdaran behsa kesên wekî ‘Ebdurrezaq Kamil Bedirxan, Huseyîn Ken‘an Paşa, Seyîd Tahayê Şemdînî û Simko Axa dihête kirin ku ka Ebdurrezaq Beg çawa dihête kuştin û Seyîd Taha û Simko Axa çawa piştî xwe didine Êrîsan. Şair piştî van behsan, careke dî tete ser rewşa Kurdên Stenbolê, halê saziyên Kurdan ên ku wê demê li Stenbolê hatibûne avakirin û di nava rojên dijwar yên Şerê Cîhanê de têtikiliyên Kurdan digel Tirkan diînîte ber çavan:

Bi hîle qehbetî Ebdulrezaq anîn û jehrî dan  
Ewan zen kir meh w bûne, ne Kurd mane ne Kurdistan

Girêdan wan *Civata Hîvîyê* mesdud ma *Rojî Kurd*  
Hemî Turk in di eslê xwe di dinyayê çunîne Kurd

....  
....

Civatek çêkirin resmen Şerîf Paşa murexxes bû  
Di Parîs da wekîlê me jî bo Kurda nê ew kes bû

Civatek dî me çêkiribû ji bo ‘ilm û ji bo ‘irfan  
Du rojnave hebûn yek *Jîn* we ya din navê *Kurdistan*

Evdirrehîm Rehmî Hekarî gava van serencaman hemûyan vedibêjît, ne wekî Kurdekî elalade hîs diket û radigehînit. Lewra ew di nava civata Kurdan de kesekî bijarte bû û kesên ku behsê jê diket heval û dost û destebirayên wî bûn. Herçend zêdetir li ser nivîskarî û rewşenbîriyê ve bihête nasîn jî wî di her fîrsetê de ji bo doza Kurdewariyê bi qelemê xwe piştevanî kiriye. Çawa ku di kovara *Jînê* de yê zêdetir bi Kurdî, nivîs û helbest weşandî ew e, herwisa -wekî ku di beytên jorî de jî derbas bûyî-yê ku li ser jîyana Kurdên wê demê nivîs û helbest nivîsîy jî her dîsa ew e. Di beytên jorî de behsa Şerîf Paşa, rojnameyên *Jîn* û *Kurdistanê*, *Rojî Kurd* û “Civata Hêvî”yê diket. Gava mirov li nivîsên wî yê din dinêrit, mirov dibînit ku wî gav bi gav li ser bûyerên rojane nivîsiye: gava xeber dihêt ku Hemzeyê Muksî li Mêrdînê şehîd ketiye ew radibit di vê gavê de li ser wî bi navê “Şehîdê Kurdistanê: Hemze” helbestekê dinivîsit û roja paştir di rojnameya *Jînê* de diweşînit (*Jîn* 36; Malmîsanij 308). Lê xeberê şehîdbûna Hemze rast dernakevît. Herwisa gava li Stenbolê “Civata Dayîkan” têtê avakirin ew dîsa di rojnameya *Jînê* de ji bo vê civatê bi navê “Ji Bo Civata Dayîkan”<sup>6</sup> helbestekê dinivîsît. Ligel wan Evdirrehîm Rehmî di salên paştir de jî di kovara xwe ya bi Tirkî, *Ehli*

6 binêre: Evdirrehîm Rehmî. (1919). “Ji Bo Civata Dayîkan”. *Jîn*. hej: 22. Evdirrehîm Rehmî Hekarî dixwazit vê helbesta xwe di 28ê Nîsana 1919ê de digel tercumeya wê ya Tirkî di rojnameya *Serbestîyê* de biweşînit. Lê ew dihête sansûrkirin û tenê Tirkiya helbestê derdikevît. Ji ber hindê jî roja paştir (29ê Nîsanê) di rojnameyê de ji bo vê helwesta Îdareya Sansûrê gazinde têne kirin.

*Sünnetê* de li hember êrîşên medyaya Tirkan piştevanî û berevaniya Bedîuzzeman Seîdê Kurdî jî diket...

Rewşenbîr û zanayên Kurd ên di serê sedsala borî de jiyabûn, ji ber têkçûna serhildana Şêx Seîdî, yan hatibûne kuştin û nefikirin yan jî li hember pergala nû ya Cumhuriyeta Kemalîst bédeng mabûn. Bingeh û mîrása wan sazîyên Kurdan ên ku Rehmî Hekarî li jorî behsê jê diket, piştî îlankirina Cumhuriyetê ji binî ve hate rakirin. Ji ber wê jî zanayên wekî Rehmî Hekarî bi aşkera û dengê bilind neşiyane rexne û berevaniyê biken. Piştî kovar û rojnameyên wekî *Jînê* jî hatine girtin êdî dengê rewşenbîrên Kurd bi temamî qut bûye. Ev bédengiya ku di salên 1920an de destpêkirî heta salên 1950yan dewam dike ku piştî wê navberê heta ku zavayê Rehmî Hekarî, Musa Anter piyeseka Kurdî *Birîna Reş* diweşînit yek berhema Kurdî nahête weşandin.

Di vî halê sukûtê de Rehmî Hekarî dîsa jî bédeng nemaye û her gav di nava xebat û karê nivîsînê de bûye. Lê wî dîsa jî ji ber zordariya desthilatdaran êdî neşiyaye berhemên Kurdî çap biket. Lê kovara xwe ya bi Tirkî *Ehli Sünnetê* derdixît û kêr jî bît car car behsa meseleyên Kurdan diket. Herwisa herçend neşiyabîtin ku biweşînit jî penive/weşartî dewamê li nivîsîna berhemên xwe yên Kurdî jî diket. *Gaziya Welat-4* û ev pişkeka ji wê kitêbê “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” jî yek ji wan berhemê Rehmî Hekarî ye ku piştî îlankirina Cumhuriyetê hatiye nivîsîn, lê nehatiye weşandin. *Gaziya Welat-4* ji helbest/beşên cuda pêk hatiye û mixabin tenê yek nusxeya wê berhemê heye. Piştî her helbestê tarîxek cuda hatiye û li xilasiya “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” jî tarîxa hatiye nivîsîn “1 Çiriya Ewwel 1945” e. Bi nezera me ew destxet bi xwe malê Rehmî Hekarî ne ku bi destê xwe nivîsîne. Lê ihtimaleke di jî heye ku belkî yekî mustensîxî ew meşq kiribît. Lê her çawa bit, Rehmî Hekarî di vî dewrê nû de li ser tarîxa Kurdan berhemek nivîsiye û neşiyaye wê biweşîntin.

Wêca gava ku Evdirrehîm Rehmî Hekarî behsa wan rojên ewil yên avakirina Cumhuriyetê diket û bi awayekî aşkera teswîr diket ku em paşî çêtir fêrîm diken ka rewşenbîrên Kurd ên wan salan bo çî bédeng mane û çima rewş xirab bû. Di van beytên ku Rehmî Hekarî behsa van tiştan diketin de tişteke di heye ku gelek balkêş e. Ew jî ew e ku ew rast-rast damezînerên desthilatdariya nû dikete hedefa tîrên xwe û di serî de Mistefa Kemal û Qere Kazim, rexneyên xwe yên dijwar rêz diket:

Nifûza şêx û beg mellan di de‘waya rîyaset da  
Reqabet hate meydanê fesada wan nîhayet da



Civatê da nîfaqek xef hebû daîm fesadawer  
Digel hindê newesta bû xebata millyetperwer

....  
....

Ji Selanîk mirovek bedesl belku heramzade  
Xwe kir şêxek mezin şaş da serê xwe bû melazade

Şev û roj kevtê mizgeftan bûye abid şerab rakir  
Wekî dewrê seadet wî tewaw şoxlê xirab rakir

Musulmanan digo Mehdî cîhada ekber îlan kir  
Desîsa wî kirî esla ne îblîsa ne şeytan kir

....

Bi namûsa xwe sûnd xwarin ji bo Xalid Begê Cibrî  
Heta heqqê we Kurdan em nedin haram be me mêrî

....

Tehemmûl wan nekir Xalid Beg û Yusuf Zîya kuştin  
Çirayê me vekuştin ma kesî eqlî li ser hiştin

Qirara qetlê-amê da di Palo û Dêrsim û Axrî  
Bûye mezbeh ji bo Kurdan bi milyon jin û zarî

Evdirrehîm Rehmî Hekarî çawa ku di serê vê tarîxa xwe “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” de heta demên dîr çûye û ew demên kevin yên Kurdan bi sitayîş vegotine, piştî vê rewşa Cumhuriyetê û têkçûna fikra millî ya Kurdewar dîsa vedigerîte ber demên kevintir. Lewra di vî halê hazir yê serê cîhanê yê yekê de gelek dewlet parçebûne û gelek dewletên nû jî avabûne. Lê halê Kurdan ber bi xirabiyê ve çûye. Wêca di halek wisa de Rehmî Hekarî vedigerît bo demên xweş yên Kurdan ku beriya desthilatdariya Osmaniyan li Kurdistanê peydabûyî.

Di serî de mîrekiyêt Bohtan û Hekkariyê -li gor Rehmî Hekarî- Kurdan bîst û pênc mîrekî hebûn û di bin îdareya wan mîrekiyan de ‘ilm û huner û fennan şax dida û millet şad û mesûd bû. Di bin desthilatdariya

wan mîran de şair û ‘alimên wekî Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Bohtanî, Mela Eliyê Hekarî û Mistefa Pertew Beg rabûne û alaya edebiyata Kurdan bilind kirine. Lêre jî êdî Rehmî Hekarî behsa wan şair û berhemên wan diket û têkiliya şair û mîran û pêşketina edebiyatê bi xêra wan, ji ser Mîr ‘Îmadeddîn û Melayê Cizîrî ve hosa vedibêjît û heta patronaja Mîr Bedirxanî diînîtin:

Ji Bohtan Mîr ‘Îmadeddîn xweyê ‘ilm û keramet bû  
Di gel Mela Ehmedê Cizîrî bi şî‘r û hem bi sohbet bû

Emîrê dawîyê j’ mala ‘ezîzan Mîrê Bedirxan  
Ehemmîyet we daye ‘ilmî her cî bûye ‘ilmistan

Dibêjin sêsed û şêst medrese çêkir bi destê xwe  
Feqî bîzzat dikirne îmtihan d’gerîya di mulkê xwe

....  
....

Şerefxan Beg nivisî bo me tarîx nav *Şerefname*  
Bi fezl û ‘ilm û zanîna heta îro şeref da me

Di Mûş û Palo û Wanê Mehmudan û di Westan  
Xelat û Elcewaz Erdîş Elajgirt heta Erwan

Were Gincê Xozatê we Xerpûtê heta Sîwas  
Reha, Meraş û Intabê cihê Kurdan muheqqeq xas

Diyarbekirê di gel Mêrdîn Hema Himsê we Dêrezor  
Were Sencar û Behdînan Suleymanîye û Şehrezor

B’hizaran medrese mizgevt û zawîye kutubxane  
Hebûn tê da fuhûl û ‘alim û keşşaf û yêkane

Rehmî Hekarî piştî halê Kurdan yê sedsala borî teswîr diket û dîsa rojên xweş yên di tarîxa Kurdan de diînîte bîra me, vê carê jî li hember Cumhuriyeta laîk û ladînî behsa bingeha fikra Kurdewariyê diket û li hember fikrên Darwînizm û Masontiyê, xwe jinû ve dispêrîte dîne heq û Hezretî Îbrahîm û pêxemberêt dî. Lewra li gor wî esasê dîne tewhîde

babê Kurmancan danaye û divêtin Kurdên wê sedsalê li hember fikrên batil, dîsa xwe bi bendikê dîn û tewhîdê ve girêbiden:

Ne Darwîn nas dikim îro ne Farmason û bêdîn im  
Ji fikra bab û bapîran û îmana xwe hiltînim

Xudê yêk e, wekî babê xwe Îbrahîm dizanim Heq  
Muheqqeq bêşirîk e bêheval e Xaliqê Mutleq

....

Esasê dînê Tewhîdê ku bab û bapîrê me danî  
Were êdî nebe munkir tu Kurmanc î bê îzan î

Sebeb û bingeha van gotinên Evdirrehîm Rehmî ew e ku desthilatdariya nû çawa heqên Kurdan bînpê kirbin û xwastibin Kurdan ji meydanê raken, herwisa wan xwastine dîn û baweriya heq jî bînpê biken. Ji ber hind jî Rehmî pêşiyê behsa pêxemberên heq û baweriya Kurdan ya bo wan diket û paşî gotinê -bi şiklekî ne aşkere- diînite ser peyker û abîdeyên Mistefa Kemalî. Lewra li gorî wî di mulkê Kurdan de abîdeyên wisa nebûne û Kurd di qedîm de li ser dînê heq bûne û wan hewceyî bi perestina put û seneman nekiriye.

Şair piştî van hemû neqlên tarîxî gazî neslê nû diket û ji xortan dixwazit ku ew bên û tarîxa xwe ya *zêrîn* bixwûnin. Rehmî Hekarî piştî ku rewşa Kurdan ya berê ya “mukemmel/îdeal” û halê “xirab/real” yê sedsala dawî vedibêjît; yanî piştî teşhîsê, dest bi behsa rêyên tedbîr û tedawiyê diketin. Li vir tiştê ewil ya balkêş ew e ku şair gaziye kesên xort diketin, lewra di tarîxa Kurdan ya wî çaxî de têkçûn û mexlûbiyet peyda bûne û nifşa berê ji ber tirs û xofan bêdeng mane û hêvî maye bi genc û xortan. Ji aliyê dî ve jî Evdirrehîm Rehmî Hekarî dizanît ku ji bo avakirina fikrek nû muxeteb dê her xort û genc bin. Ji ber hindê jî ew gaziya xwe digehînite nifşên nû û ji wan çend tiştên ecêb dixwazit ku ew tişt heta Rehmî Hekarî di tarîxa Kurdan de wisa bi tundî nehatine gotin.

Gava em wan tiştan dinêrin Rehmî Hekarî beriya her tiştî digel ku xitabê li gencan diket û ji wan bixwazit ku ew tarîxa xwe ya *zêrîn* bixwûnin, dixwazit ku ew xort bibine zana lê nebine vexwerê mey û şerabê; divêtin ew xwe nêzîk zîneyê neken û heqê kesekê nexwen. Herwisa divêtin ew bixwûnin û asta medeniyeta milletê Kurd bilind bikin û di rêya milletperwerî û dînperweriyê de xwedanxîret bin ku ew hem Kurmanc in û mukafata wan bi vî şiklî serkeftin nebe jî dê bibîte Cenneta e’la:

Were xortê delal tu b'xwûne tarîxa xwe ya zêrîn  
Ji dil dîqqet bike xwe b'zan bibe fa'ilê 'ibret-bîn

Mexwe esla meyê lewra ew e dujmin ji bo 'eqlan  
Ne zînha[r]i zînayê lew ku namûsa te ye însan

Nexwe heqqê kesê lewra da fezîlet mani'a zînhar  
Bi namûsa xwe mal bicivîn neke zulmê nebe cebbar

Bixwûne, xwendina te bo me kîmya ye bike cehdê  
Bi cehda xwe bilin[d] ke milletê xwe werbike 'ehdê

Bibe însanekî kamil fezîlet bit şî'ara te  
Tu Kurmanc î ewan hişyar bike 'eynê heyata te

Di rêya dîn û millet da fida be xem mexwe esla  
Ji bo te hazir e bêşik bizane cenneta e'la

Berhema Evdirrehîm Rehmî Hekarî “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” bi vî awayî wekî reçete û wesiyetekê xilas dibit. Ew jî taybetiyeka dî ya Rehmî Hekarî û berhema wî ye. Lewra şair hem di pîratiya xwe de vê tarîxê dinivîsît hem jî wekî rewşenbîrekî Kurd ê dîndar, ji bo pêşeroja milletê xwe stûnên saxlem didanêtin. Jixwe ev taybetiya wî ne bi vê tarîxê ve mehdûd e. Lewra wî hem di *Wesiyeta* (Zapsu 2006: 11-15) xwe de hem jî di kitêbên ku ji bo zarokên xwe nivîsîne<sup>7</sup> de eynî tiştan ji malbata xwe re jî dibêjît.

### Encam

Ji nivîsîna *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî heta vê sedsala dawî, di bin-hêşiya metnên Kurdî û hêşê Kurdan de li ser meseleyên millî û netewî *nêrînek hevpar* heye. Ew nêrîn û hafize jî li hember bê-xwedan-mayîna nixrên netewî û înkara pîroziyên millî yên wekî çand û ziman, geş bûye û heta îro hatiye. Çawa ku Ehmedê Xanî û Hacı Qadirê Koyî li hember zimanên biyanî berevaniya zimanê Kurdî kirine, Evdirrehîm Rehmî jî hem bi naverok hem jî bi zimanê nivîsên xwe ve ev helwesta *hevpar* pêş êxistiye. Lewra Rehmî Hekarî jî wekî Xanî dibêjît “Eceb kî ehmeq e bêjîte me bêesl û bêbunyad.”

7 binêre: (Zapsu, *Metin'in Din Sorguları.*; Hale'nin Din Sorguları).

Bi vî şiklî Rehmî Hekarî herwekî şairên beriya xwe, di meseleyên millî de eynî tişt gotine û helwesta xwe diyar kiriye. Di “Perek Zêrîn Ji Tarîxê” de jî arguman û delîlên xwe wisa pêşkêş diket ku hem ji aliyê dînî û me’newî ve hem ji ji aliyê netewî ve dibîte yek helqe ji silsileya ekola şairên beriya xwe.

Çawa ku di binehêşê şairî de digel dîndariyê, welatparêziyek xurt heye, di metnên wî de jî herwisa fikrên dulayane peyda dibin. Ew jî ji bo tesbît û nirxandina dewrê dûmahîkê yê Osmanî û dewrê ewil yê Cumhuriyeta Tirkî gelek agahiyên berfireh radiêxîte ber destê xwendevan û lêkolîneran. Lewra Evdirrehîm Rehmî hem di van dewran de jîyaye hem jî wekî entellektulekî Kurd yê navdar, bi nivîs û nêrînên xwe ve şexsiyetekî girîng e. Bi vî awayî bi têgeheştin û pêzanîna nêrînên kesayiyên wisa tarîxa milletên wekî milletê Kurd -ku heta niha tarîxa wan zêde bi berfirehî nehatîne nivîsîn- dê ronîtir bibît.

## Çavkanî

- Âşık Paşazâde. (2003). *Tevârîh-i Âl-i Osmân (Osmanoğullarının Tarihi)*. (haz: Kemal Yavuz; M. A. Yekta Saraç). İstanbul: K Kitaplığı.
- Bozarlan, M. E. (1985). “Pêşkêşî.” *Jîn*. (cild 1). Uppsala: Weşanxana Deng.
- Bulaç, Ali. (?). *Kur’an-ı Kerim ve Türkçe Anlamı*. İstanbul: Bakış Yayınları.
- Evdirehîm Rehmî. (1919). “Ji Bo Civata Dayîkan”. *Jîn*. hej: 22.
- Geverî, Ayhan. (2012). “Şeyh Rıza Talabanî ve Sultan Abdülhamid’e Yazdığı Kasideleri.” *Kürt Tarihi*. sayı: 1. s. 46-51.
- Kılıç, Hazım. (1991). *Evdirehîm Rehmîyê Hekarî*. Danmark: Weşanxaneya Xanî & Bateyî.
- Malmîsanij. (2002). *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Mevlânâ Mehmed Neşrî. (2008). *Cihânnümâ (Osmanlı Tarihi 1288-1485)*. (haz: Necdet Öztürk). İstanbul: Çamlıca Yayınları.
- Pîrbal, Ferhad. (2002). *Ebdurrehîm Rehmî Hekarî*. Duhok: Weşanxaneya Spîrêz.
- Şerefhân Bitlîsi. (2011). *Şerefname*. (cilt 2). (çeviren: Osman Aslanoğlu). İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Tosh, John. (2005). *Tarihin Peşinde*. (çeviren: Özden Arıkan). İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Zapsu, Abdurrahim. (1921). *Dersa Dîn*. İstanbul: Necm-i İstiklal Matbaası.
- Zapsu, Abdurrahim. (2006). *Büyük İslâm Tarihi*. İstanbul: Risale Yayınları.
- Zapsu, Mustafa Pertev. “Abdurrahim Zapsu’nun Kısa Özgeçmiş ve Eserleri”. (Zapsu 2006: 11-15).